# ENCAMNAME
# HEVDÎTINA EKOLOJIYÊ YA AMEDÊ
# 22 GULAN 2022

Modernîta kapîtalîst û rewşa wê ya sazîbûyî dewlet û sermaye(sermiyan) di têkiliyên civakî de çewsandin, di têkiliyên aborî de jî bi rêbaza kedxwariyê xwe saz dike. Navendên sermayê ji bo ku kara xwe zêde bikin serdestiya ku li ser xwezayê pêk tîne, xerakirina ekolojiyê di dehan sal de gihandiye asta hilweşîner.

Di encama şer û polîtiqayên neolîberal de; pêşbirka dewleletan ya hilberîna enerjiya zêdetir, li qadên çandiniyê bi bikaranîna amûrên kîmyewî yên zede re belavbûna nexweşiyan, çemên di nav HES û bendavan de hatine girtin, vekirina qadên daristanan ji kedxwaran re, bajarên pençeşêrbûyî, yekdestdarî û yekçandiya li ser hilberîna çandiniyê, kûrkirina têkiliyên hiyerarşiyê û di encama serdestiyê de cîhan ji bo zindî û ne zindiyan hatiye asta ku nikarin lê hebûna xwe bidomînin.

Qonaxa niha di asta gerdûnî de weke qeyrana ekolojiyê, qeyrana aboriyê, qeyrana demokrasiyê û qeyrana civakî, serdemeke qeyranên pirhêjmarî û pirhêlî tê jîyîn. Vê rewşê li ser xweza û civaka ku parçeyeke ji xwezayê ye bandoreke wêranker pêk anî. Ji bajarên pençeşêrbûyî, pêkanînên dijdemokrasiyê, nîjadperestî, tundiya li hemberî jinan, komên mirovan ên îzolekirî, zehmetiya xwe gihanduna xwarinê, pergalên ekolojiyê yên diguherin, cureyên zindiyan yên wenda dibin û qeyrana avhewayê jî tê dîtin ku pergalên heyî qeyranan çêdikin û hebûna xwe bi mezinkirina qeyranan didomînin.

Li ku dera cîhanê dibe bila bibe, tevahiya têkoşînên ekolojiyê yên li hemberî pergala ku qeyranan çêdike û ji qeyranên heyî xwe têr dike têdikoşin hêja ne û bi cerebeyên ku mirov jê sûd bigre dagirtîne. Lê mixabin hem di asta gerdûnî de hem jî di sata xwecihî de, ji ber rewşa perçebûyî û bêrêxistiniyê nikarin pergala qeyranê ya heyî derbas bikin. Rastiya ku xerabûneke ekolojiyê ya li ciheke cîhanê, bandorê li hemû gerdûnê dike bi pandemiya dawî re careke din hat dîntin. Çawa ku xerabûneke ekolojiyê ya li ciheke cîhanê li ser hemû cîhanê bandor dike, çawa ku hilma em ji hewayê digrin hevpar e, kes, sazî û aktivîstên xwedî hişmendiya ekolojiyê jî divê demildest bi heman ferasetê li hember qeyranan di tekoşîneke hevpar de bigihîjin hev.

Li ser van bingehan em kesên ku jiyanê diparêzin yên li Tirkiyê û Kurdistanê dijîn di 22.05.2022 an de li Himama Deva ya navçeya Amedê, Sûra ku hat xerakirin bi sermijara ‘ HEVDÎTINA JIYANÊ YA DI DORPEÇA HILWEŞANDINÊ YA LI SER EKOLOJÎ Û CIVAKÊ DE’ hatin cem hev û me ‘LI HEMBERÎ XERAKIRÎNÊ RÊYÊN TEKOŞÎNÊ Û JI NÛ VE AVAKIRINÊ’ nîqaş kir.

Hevdîtina ku plansaziya wê li gorî du rûniştinan bû, piştî axaftina vekirinê bi pêşkêşiya xebatên Komeleya Ekolojiyê ya Amedê dest pê kir. Di hevdîtinê de cerebeyên xwecihî hatin parvekirin, dûre panel pêk hat û bi forimê hevdîtin bi dawî bû.

Nirxandin û parvekirinên di rojêkê de hatin kirin:

- Carînan di şeran de gihîştina bikaranîna çekên kîmyewî, rê li xerakirina ekoloji û civakî vedike. Şer dibin sedema kirkirina gelek zîndewaran û di pergala ekolojiyê de hemû zîndewaran neçarî

koçberiyê dikin. Ji ber van sedeman dive em karibin bêjin ku şer, hilweşînerê herî mezin yê pergala ekolojik û civakî ye. Ji ber vê dîvê were gotin ku xala sereke ya ekolojiyê aşîtî ye. Divê hemû sazî û dilxwazên ekolojiyê mijara aşîtî û ekolojiyê ji bo xwe bikin rojev û lihemberderketineke giştî ya şer were meşandin. Ji ber hemû hevalên li vê dere jiyan û heqîqetê diparêjin, li vê derê divê bi zelalî dawxwaza aşitîyê hebe û li hemberî şer tekoşîna aşitiyê domdar be.

- Nakokiya di navbera xweza û kapîtalîzmê de careke din nişan dide ku divê lêgerîneke tekoşînê ya nû ku ji hawirdorparêziya klasik wêdetîr were pêşxistin. Li cihê nêrîna navendmirov divê tekoşîneke bihevrebûna hemû zindî –ne zindiyan diparêze were pêşxistin. Divê nîqaşa nêrîneke ku ne însan ne jî xwezayê digre navendê were kirin, rê û rêbaza tekoşîneke herduyan bi hev re were pêşxistin.
- Heskîfa ku dîroka wê digihîje hezar salan li pêşberî çavên hemû cîhanê hat tunekirin. Dîsa li ber çavên hemû cîhanî cihê ku em hevdîtina xwe lê dikin, ‘Sûrîçî’ya ku din av mîrateya çandiya UNESCOyê de ye hat talankirin. Divê rexnedayîna vê were kirin, balkişandin li ser vê hilweşînê bin û neye jibîrkirin. Li hemberî hilweşînê divê bîreke kolektif were avakirin.
- Tekoşîna ekolojiyê di heman deme de tekoşîna azadiya jinan e. Ji ber vê pêwistiya li hemû qadên jiyanê reng û dengê jinan derkeve holê û li dijî têkiliyên desthilatdar ên li hemberî jinan xebatên pêwist bên meşandin.
- Dixwazin li Payîzavaya Wanê kana mermeran, li Geliyên Zorê û Sarimê HES’an ava bikin. Carînan bi hinceta ewlehîyê gundan vala dikin, bendavan çêdikin, daristanan dişewitînin, carînanjî ji bo kara zêdetir ya sermayedaran biçêkirina kanên kevir û madenan xwezayê talan dikin. Bi van rêbazan gelê li Tirkiye û Kurdistanê dijîn ji cih û warên wan dikin, dixwazin wan bê nasname bihêlin.
- Deshilatdariya siyasî bi pêşkêşkirina hemû Tirkiyê ya ji sermaya xwecihî û navdewletî re heremên bi hezaran zindî lê dijîn ên wekî Bergama, Cerattepe û Kazdaxî jî ji zîndiyan xalî dike. Çiya deşt û zevîyên me yên bedewiyên xwezayî qurbanî bi dehan kanên zêr û kevir ên hatine avakirin an jî plansaziya avakirina wan hatiye kirin, dikin. Rihê berxwedanê yê li hemberî vê talanê derketiye holê hê jî berdewam dike, desthilatdariya ku forum û rexistiniya li wir nikare dakurtîne bi erîşên hêzên leşkeri dixaze bifetisîne. Berxwedana kul i Bergamayê di 1989’an de dest pê kir, li Kazdaxiyan di roja 425’an de berdewam dike. Tekoşîna rasterast û dadî ya yên niha berdewam dikin pêwîst e ku bi hemû tekoşînan û parêzvanên jiyanê re werin hevparkirin.
- Hat diyarkirin ku li Dêrsimê 145 heb kanên madenan hatine vekirin, gel neçar maye ku ji cihê dijîn koç bikin, xerabûneke micît qewimîye, li hemberî vê pêwistî bi tekoşîneke dadî û rêxistinkirina berxwedanê heye. Çemê Mûnzûrê û derdorên wê ji kirê (rant) û talanê re hatiye vekirin, li hemberî vê bi dehan serlêdanên betalkirinê bê dawî mane.
- Mirov li hemberî dewletê ji bo cihên xwe yên jiyanê biparêzin bi hemû hêza xwe têdikoşin. Welatiyên sûrê yên tevlî forimê bûn diyar kirin ku heta dawiyê ew ê têbikoşin û dest ji Sûrê bernedin.

- Hat diyarkirin ku ji wêrankirinên ekolojiyê yên li Tirkiyeyê pêk tên re di heman astê de bertek nayê dayîn, bi taybetî wêrankirinên ekolojiyê yên li bajarên kurdan tê pîştguhkirin, neteweya serdest, li hemberî tekoşîna neteweya bindest weke ker, kor û lal be tevdigere. Li hemberî hemû pirsgirêkên ekolojiyê bi hinceta ewlehiya navendî bêdeng dimînin û tevlî tekoşînê nabin. Bi polîtiqayeke tunekirinê ya bi zanebûn erîşên li hemberî nixên kurdan yê hevpar berdeam dike. Niha li devera bi navê NEWALA QESABA ku gora komî ya bê serû bin e plansaziya çêkirina vîllayên dublex dikin. Navê wan jî dikin vîllayên jiyanê. Ev êrîşkirina nirxên me ye. Divê li hemberî êrîşên bi vî rengî li her deverî bi heman hestewariyê beyî ku bine rin li ku derê û tê sere kê perteka pêwist were nişandan.
- Di serî de Heskîf, ji bo hemû cihên dîrokî û xwezayî nîqaşa bi koçberiyê re pirsgirêkên derûnî, aborî û civakî were kirin. Li hemberî vê divê plansaziya çalekiyê were kirin.
- Di vê hevdîtinê de divê bi hevkariya dewlet û sermayê talankirina xwezayê ku li hemberî erdnîgarî û civakên cuda pêk tê re bejin bes û bi rihekî hevpar tevbigerin. Li hemberî kapîtalîzma dirinde tekoşîneke civakî pêwist e û bi polîtîqayên şênbertir berdewamkirina tekoşînê weke peywirekê li pêşiya me ye.
- Cîna sermayedar xwe li ser mêtina keda mirovên ji neçarî koç kirine ava dike.li ser laşê kedkaran xerakirina ekolojiye pêk tê. Li bajaran xerakirina ekolojiye jî bi pêvajoya laşe karkeran yê bi dûçarmana Aspestê dest pê dike. Di qonaxa niha de despêkê laşe me dûre hemû qadên me yên jiyanê dikeve bin nîrê kedxwariyê. Dîvê xebata ku tekoşîna bajar, karker û ekolojiyê bi hev re bimeşe were kirin.
- Wêrankirina li ser ekolojiyê û şer bi tenê li ser mirovan na, di heman deme de li ser ajalan jî neyînî bandor dike û wan neçarî koçkirinê dike. Ji ber zimanê ajalan tune nikarin derde xwe bejin. Li vir peywira me ya em bibin zimanê wan jî heye. Ji ber vê yekê hemdem tekoşîna li hemberî wêrankirina ekolojiyê û tekoşîna mafên ajalan a ku tu cudatî nake navbera ajalan were dayîn.
- Di demen dawî de bi taybetî li bajaran zarokên ekofobîk ên ku li navendên danûstendinê, ji axê dûr, ajalan nas nakin mezin dibin. Ji ber ku zarok hem bi xwezayê re têkildar bin, hem jî hilberîna çandiniyê nas bikin divê mifredata perwerdehiya ekolojiyê (agroekolojî) were çêkirin. Ji bo ku di mifredata perwerdehiya fermî de cih bigre divê xebatên pêwist bên kirin.
- Wekî ku Jose Martîn gotiye: ‘ Gele ku nikaribe hilberina xwerina xwe bike kole ye, nikare bibe xwediyê azadiyeke biçûk jî’ ji ber vê yeke di asteke biçûk de be jî divê hilberîna çandiniyê bi nêrîna ekolojiye were kirin, komên hilberîna xwarinê werin avakirin.
- Li hemberî xwezayê sûcekî pêk tê, ev sucekî navnetewî ye. Ji bo sûcên li hemberî xwezayê bikeve nav zagonên cezakirina dadî divê tekoşîn were dayîn. Xirabiyên li hemberî xwezayê weke sûcê kirkirinê, sûcê şer were qebûlkirin. Divê weke kirikirina ekolojiyê were zanin.
- Rêxistinkirina komîn û koperatîfên demoratîk û wekhevîparêz, jerkuja li hemberî çîna kapîtalîst e. Gelek girîng e ku em heta dikarin xwe ji jiyana pargala heyî dûr bixin, elimandinên pergalê biguherînin

û vê nerînê li derûdorên xwe belav bikin. Divê em çanda pevguherînê pêş bixin. Têkilatiyên xwe yê pêvgirêdana neçarî bişkînin, ji hilberînerên xwecihî danûstendinê bikin. Bi qasî ku pêkan e divê em amûrên kîmyewî ji jiyana xwe derînin û bala xwe bidin hiberîn û bikaranîna tiştên xwezayî.di heman deme de girînge ku lêkolînan bikin da ku şopa me ya qarbonê li hemberî qirêjiya ku giresitêrkan tehdit dike kêm bike û hestewariya civakî di vê hêlê de bi pêş bixin.

- Li hemberî şewitandina daristanên Kurdistanê û kirkirina Çiyayê Qazê divê helwest û tekoşîneke hevpar bê meşandin. Werankirin û talana ekolojiyê bibe xema me ya hevpar. Divê hevdîtinên bivî rengî gelek caran li cihên cüda û di demen cüda de pêk werin. Divê em pir rengî û pirdengî bin. Divê di her şert û mercî de tekoşîn bidome, polîtîqayeke hevpar were diyarkirin û li heremeke din em karibin plansaziya civîneke pêşwext bikin.
- Em di wê baweriyê de ne li hemberî polîtîqayên kapîtalîzma ku mirov ji cewherê xwe dûr dixe û talan dike, encax bi honandina xeta ekolojiyê ya civakî ya radîqal serkeftin pêkan e. Em bawer dikin ku çareserî di xeta tekoşîne ya hepar re derbas dibe.

KOMELEYA EKOLOJIYÊ